# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (156):

## Gundên "Gobeleka û Xilalka" yên dagîrkirî, girtinên bêsûcane, rawestandina bikaranîna rêdanên (wekalet) malmewalan, şewatên daristanan, topebarankirina sivîlan, geregoşî û serberdayetî
























Mihemed Elcasêm, Sêf Ebû Bekir, Fehîm Îse, Fedil Elah Elhecî, Selîl Elxalidî, Ebid Elah Helawê, Yasêr Ebid Elrehîm, Hesen Xeyriyê, Mihemed Hemadîn...HWD" û milîseyên wan ên bi "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî - Elceyş Elwetenî Elsûrî" (ya girêdayî "Kiwalisyona Sûrî - Itîlafa Sûrî" û bi ser Turkiyê ve") têne navdan, di karanîna tewanên şer û tewanên li dijî mirovahiyê bi şêwakî fere -bi taybetî jî li Herêma Efrînê ya dagîrkirî, ji dema dijberiya ku hatiye ser ve, li 20.1.2018an Z - ji "Hatêm Ebû Şeqra" û "Ehrar Elşerqiyê" nayêne cudakirin.

**Emê li jêr hin ji wan tewanan pêşber bikin:**

**= G. "Gobeleka":**

Bi navça Şera ve girêdayî ye û /20/KM li Bakurê Bajarê Efrînê dikeve, ji /60/malî pêkhatî ye, dora /225/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, û dora/120malbat=600nişte/ ji anîndeyan têde hatin niştecîkirin.

Di dema dijberiya ser herêmê de, /3/mal ên van hemwelatiyan"Mehmûd Xelîl Hisên, Nebî Yûsêf Hisên, Mihemed Yûsêf Hisên" bi tevayî û /12/jî bi piçekî hatin wêrankirin; Di dema desteserkirina gund de, Milîseyên "Firqit Melekşah" firaxên baqirî, şaşên tilfizyûnan, cerên gazê û amûrên energiya elektirîkê ji hemî malan dizîn; Û pişt re dizîna hemî heyînên malên ên zorane koçberkirî, herweha jî /25/ giropên zayendokên(genarator) elektirîkê, hemî amûrên rawestgeha (satasyûn) avhilkêşa ava vexwarinê ya giştî ya ku ta niha derveyî xizmetguzariyê ye, /4/ tirektorên çandiniyê (yên ku xwediyan piştî dandina vêrgiyeke diravî vegerandine), /2/ makîneyên ku weke amanet di malekê de seknandî, /5/matorên dutekerî, /7/ avkêşokên "xetas" ava avdanê, amûr û pêdiviyên şuştingeha makînan a "Ramî Mihemed Behrî", hemî kebil (kêbil) û tiransa toreya elektirîkê û stûnên wê yên darî yên li derveyî gund, keblên telîfûna zemînî, û amûr û tiştmiştên giropa zayenda elektirîkê (Ampêr) ya hemwelatî "Kemal Ebid Elsemed".

Û milîseyên ku mala "Mihemed Nûr" ji xwe re kirine biryargeheke leşkerî, /50%/ ji berhema werzên zeytûna yên hemwelatiyên ne li gund û /15%/ jî li yên li gund, ji xwe weke vêrgî distînin, û bi ser de jî dizîna zeytûna, simaq û tirî bi rengekî fere.

Û herweha dest danine ser avahiya "guvêşgeha dewletê" û kirine axurê pêz û çêlan (ên ku bê wijdan di nav zeviyên çandiniyê de têne çêrandin), û herweha jî avahiya guvêşgeha "Ebid Elsemed Ibrahîm" û anînde têde dane rûniştandin, û çandingeha "Şêxo Mihemed Elî" guheztine navendeke bazirganiya êzingên qutkirina daristan û daran.

Û milîseyan daristana çiyayê xwaringehên "Elte'axî û Amenos" a bi ser Gola "Meydankê" ve - Ro'avayê gund (a ku ji sal 1960 î ve hatiye çandin, rûberiya wê dora /35/hiktar û ji hemî cûreyên sinoberan û sindiyanê/palûtê û guvîjê pêk tê) bi tevahî qutkirin û tune kirin; Û herweha jî Zaretgeha "Qerecurnê - pakrewan Hogir" kolan û tevdan û dara wê ya çinarê ya temenmezin şewitandin, û hin gorên miriyan ên gund tarûmarkirin.

Weha jî xelkê gund rastî binpêkirinên têkel hatin, jê: Girtina hin hemwelatiyan, wek "Mihemed Horo kurê Kemêl /30/sal" (yê ku li Nîsana 2018an bi rengekî zorane hatiye veşartin, û li destpêka îsal jî hatiye berdan).

**= G."Xilalka":**

Gundekî çiyayî û mezin e, bi Navça Bilbilê ve girêdayî ye û /10/KM ji navenda wê dûr e, ji /300/mal pêkhatî ye, dora /1200/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, bi sedema koçberkirina zorane tenê jê dora/200malbat = 600nişte/ man, û dora /175malbat=900nişte/ji anîndeyan -piranî ji Bajarê Heleb û gundewarê wê- têde hatin niştecîkirin.

Milîseyên "Firqit Elhemze" gund desteser dikin, Asayişa Leşkerî ya Turkiyê çandingeha hemwelatî "Elî Beg" ji xwe re kiriye biryargeh.

Li dema êrişkeriya li ser herêmê, pênc mal ên van hemwelatiyan "Hîşam Xelîl, Xalêd Xelîl Heso, Aqûb Mihemed, Idrîs Hesen, Golîn Bîlal Hemo" bi ser de jî avahiya şaredariyê, bi tevayî hatin roxandin.

Û berî ku xelk vegere gund, malên hemwelatiyên koçberkirî rastî dizînê û talanê hatin, û milîseyan heyînên malan ji firaxên baqirî û qizêzî û xwarinvexwarinê, piraniya kebil(kêbil) û stûnên toreya elektirîkê ya giştî, amûrên energiya elektirîkê ya royê, û tirektor û otombîlên pîkab (jê: tirektora "Ehmed Mecîd") dizîn, û hin hemwelatî jî neçar bûn ku vêrgiyeke diravî bidin, da ku tirektor û makînên xwe vegerînin.

Û xelkê ku vegerîne gund rastî cûrbecûr binpêkirin û tewanan hatin, jê girtin û revandin û kêmrûmetkirin û hewildana diravbirinê, da ku wan berve koçberiyê ve têvedin; Û piştî ketina gund bi du rojan /navîna Avdara 2018an/, milîseyan hemwelatî "Bîlal Mihemed Hemo/70/sal" -yê ku bi tenê di mal de- bi kêrê kuştin, û termê wî çar rojan li piş deriyê odê ma, ta ku birayê wî di dema seredanê jê re de dît, û hin xelkê gund ew veşartin.

Û milîseyan dest danîn ser tevaya malmewdanên xelkê gund ên koçberbûyî "Menan Ehmed Xelîl, Şêxo Ehmed Xelîl, Mihemed Xelîl Bîlal Hemo, Tewfîq Mihemed Dawod, Qenber Beko Hisên, Xelîl Şêx Qenber", û çêrandina keriyên pêz û dewêr jî bi şêwakî bê wijdan di nav zeviyên çandiniyê de berdewam e.

Weha jî milîseyan li ser berhemên malmewalên hemwelatiyên ne li gund /50%/ û werzên zeytûna û tirî yên hemwelatiyên li gund jî /10%-15%/ vêrgî ferz kirin, û herweha darên ihracê li çiyayê bi ser gund ve û darên biber qut kirin.

**= Girtinên bêsûcane:**

Destlatên dagîrkeriyê ev hemwelatî girtin:

- Li 22.7.2021 piştî nîvro, hemwelatî "Hemîd Ednan Hemîd/37/sal" ji xelkê Gundê "Sêmalka" - Navça Mabeta, dema ku diçû B.Efrînê, ji aliyê Milîseyên "Rêzaniyê -Elsiyasiyê" ve - rêbenda derbasgeha bajêr, û ta niha bendkirî ye.

- Li 24.7.2021an, hemwelatî "Îmad Merwan Ereb" ji xelkê Gundê "Kerê" - N.Bilbilê, dema ku ew li bazara Bajaroka Reco, piştî birina xilyewiya wî ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê ve, û ta niha çarenûsa wî ne diyar e.

- Li 23.7.2021an hemwelatî "Ebid Elre'ûf Şêx Sîdî/50/sal" ji xelkê Gundê "Şêxotka" - N.Mabeta, ji aliyê Milîseyên "Artêşa Elnuxbe - Ceyş Elnuxbe" ve, û piştî dandina vêrgiyeke diravî ew li 27.7.2021an hate berdan, bi ser kû ew him keyayê gund e û him jî bi destlatan re hevkar e.

- Li 26.7.2021an, herdu ciwan "Xalêd Hisên Mistefa û Ramî Umer Qere" ji xelkê Gundê "Maseka" - N.Reco, ji aliyê Milîseyên "Asayîşa Sivîl" û Istîxbaratên Turkiyê ve, bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re.

- Li 27.7.2021an, hemwelatî "Ebdîn Umer Eslan/55/sal û kurê wî, Nîhad Eslan Bêrem/45/sal" ji xelkê Gundê "Şorbe" - N.Mabeta, ji aliyê Milîseyên "Rêzaniyê -Elsiyasiyê" ve li Efrînê, bi tuhmeta derketina parêziya şevê di dema Rêvebiriya Xweser a berê de.

- Li 28.7.2021an, hemwelatî "Ehmed Reşîd Hisên, Eslan Şêxmûs Hebeş" ji xelkê Gundê "Kêla"- N.Bilbilê, ji aliyê Milîseyên "Asayişa Sivîl" a Reco ve, piştî lêgerîna di malên wan de.

- Li 28 7.2021an, hemwelatî "Mihemed Elî Me'imo" (yê ku bi "Soz" tê navdan û keyayê Gundê "Çobana" - N.Reco, û yê ku mora keyatiyê berî girtinê bi rojekê radest kiriye), ji aliyê Milîseyên "Asayişa Sivîl" a Reco ve, û li roja din hate berdan.

**= Binpêkirinên virdewêde:**

- Li dema ku êrişî Gundê "Til Silorê" - N.Cindirêsê hatiye kirin, /8/ şervanên Kurd di ber gund de şehîd ketin, û di dema desteserkirinê de, Milîseyên "Ehrar Elşam" termên wan li nêzîk vêla "Ebû Rafî" li Rohilatê girê gund kom kirin, weha servekirî hîştin ta ku werimîn û bîn vêketin û goşt ji ser estiyan heliya, û piştî borandina dora heyvekê û daxwazkirina xelkê gund, rê dan wan ku bermayên terman biguhêsin û têxin coyeke avê ye kevin li Rohilatê gund û seraxkin, bê ku tu rêweresmên veşartinê yên naskirî û birêkûpêk jêre werin kurin .

-Li 25.7.2021an, Milîseyên "Firqit Melekşah" dest danîn ser mala temenmezin "Celal Ebdelah" ji xelkê Gundê "Xirabê Şera" û tevaya heyînên têde dizîn, piştî ku di encama zext û fişarên li ser hatine kirin de neçar bûye ku ji herêmê derkeve. Divê bê zanîn ku zext hate kirin, piştî nelihevkirina di navêna "Celêl" û birayê wî yê kûr "Mistefa" çêbû ye de (yên ku bi tenê di malê de rûniştibûn).

-Li vê dawiyê Milîseyên "Firqit Elsultan Mûrad" xelkê gundên ku li N.Bilbilê desteser dike agahdar kirin, ku rêdanên birêvebirina malmewalên nişteciyên resen ên ne li wir nema tên bikaranîn, û li Gundê "Kotana" di riya keyayê gund û du kes din re -bi zorê- malmewdanên yên ne li gund û yên mirî û zaroyên wan ne li wir nas kirin, û kok boye kirin, da ku destên yên ku berê bi rêve dibirin ji ser rakin û ew dêst dînin ser.

**= Şewatên daristanan:**

-Li 24.7.2021an, agirek bi daristaneke nêzîk Gundê "Gazê" - B.Efrînê ket, û "Berevaniya Sivîl" got ku tîmên wê vemirandin û /75/darên ihracê şewitîn, û ji wêneyê qutkirina daran a berê xuya dibe.

-Li 26.7.2021an, agirek bi daristaneke di navêna gundên "Cilbirê û Meryemînê" - Şêrewa ket, û "Berevaniya Sivîl" got ku tîmên wê ew agir vemirandin û têde pir asteng dîtin.

-Li 27.7.2021an, agirek bi daristaneke ihracê ye nêzîk Gundê "Keferdelê Jorin" - N.Cindirêsê ket, û "Berevaniya Sivîl" got ku tîmên wê agir vemirandin û rûberiya ku ziyan gihîştiyê /1/KM çarkoşe ye. Divê were zanîn ku daristan berê jî bi rengekî hovane ji aliyê çekdarên milîseyan ve hatibû qutkirin.

**= Bombebarankirina sivîlan:**

-Li 25.7.2021an, şeş avêjtekên mûşekî bi ser B.Efrînê de ketin, jê yekê biryargeha "Kumên Sipî (Elxuwez Elbeyda'i) - Berevaniya Sivîl (Eldîfa'i Elmedenî)" armanc kir, û li gor agahiyên "Berevaniya Sivîl", di encamê de ziyanên şênberî gihîştin hin avahî û alavan, û /8/kes jî cûrbecûr birîndar bûn.

-Di heman rojê de, hêzên Dagîrkeriya Turkiyê Bajaroka "Ehrezê" - Bakurê Heleb (ya ji koçberên Efrînê mişt) bombebaran kirin, û di encamê de, "Heysem Hesen kurê Umer/32/sal" û zaroyê wî "Umer/6/sal" ji xelkê "Meydana" - N.Reco, û "Ehmed Zekî" yê negîhayî û ji xelkê "Ehrezê" cûrbecûr birîndar bûn.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

-Ji roja yekê ji "Cejna Qurbanê" ve, gizgiziyek di nav Milîseyên "Firqit Elhemzat" de, li Gundên "Keferşîlê, Maratê û derdorê" heye, bi sedema serîhildana "Mu'itez Elebdelah" serkêşê "Lîwa'i Elxab" (ê ku stubariyên wî ji aliyê "Elfirqe" ve, li 24.7.2021an, ji dest hatine girtin, ji ber nelihevkirina wan li ser bandoriyê û malewalan), û ji ber wê jî "Firqê" li 29.7.2021an, hêzeke mezin kire deverê û rêbend û biryargehên "Lîwa'ê" ji holê rakirin.

-Li 26.7.2021an li nîvro, giropeke çekdar hemwelatî "Berzanî Ehmed Hemdoş/20/sal" ji xelkê Gundê "Gemrûkê" - N.Mabeta -dema ku bi matora xwe ya duloqî ji Bajarê Efrînê di riyeke şaxeyî re li nêzîk çateriya Gundê "Coqê" diçû gund- sekinand, mator û xilyewiya wî jê stand, û bi qundaqên çekan lêxist û li şûn xwe hîşt; Û ji demekê ve tonbûyerên weha li wê cîgeha ku Milîseyên "Firqit Elhemzat" desteser dikin, çêdibin.

-Li Şeva 27.7.2021an, dizina avkêşokek"xetas" ji ser bîrekê ji zeviyeke çandiniyê (100 kîraz û hin darên gûzê, simaqê, mêwê, û baxçek keskahiyê) ye hemwelatî "Şe'iban Osman" ji xelkê Gundê "Zerka" - N.Reco yê koçberbûyî, dizîn; Û hêjaye were zanîn ku Milîseyên "Feyleq Elnuxbe" dest danîne ser zeviyê.

- Li 28.7.2021an, pevçûnek di gel avêtina qurşînan, li Taxa"Mehmûdiyê" - B.Efrînê, di nav çekdarina de, li ser otombîlekê çêbû, û di encamê de, kesek (di Asayişa Leşkerî de, li Cerablusê, endam e) ji anîndeyên Gundewarê "Şamê" hate kuştin, û du kes din jî birîndar bûn.

Li gorî bihezaran heyîn û raporên belavbûyî yên li ser binpêkirin û tewanên ku li Efrînê bûne, ger rast Rêveberiya Amrîkî dixwaze tewankarên li ser kastîna Sûriyê bide sezakirin, bila zanibe ku lîsta serkêşên nandozên Anqerê tijî nav û giropên ku gereke weke "Ebû Şeqra" û çeteyê wî bêne sezakirin e.

01.08.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Zaretgeha "Qerecurnê - Şehîd Hogir" berî û piştî roxandinê ji aliyê milîseyan ve, û li ser oda wî "Zareta Ebû Dirame" hatiye nivîsandin.
- Pakrewan "Bîlal Mihemed Hemo".
- Giropeke ji Milîseyên "Firqit Elhemzat" li dema ku ketine G."Xilalka" - N.Bilbilê.
- Şewatek li daristaneke nêzîk G. "Gazê" - B.Efrînê, 24.7.2021 Z.
- Şewatek li daristaneke di navêna gundên "Cilbirê û Meryemînê" - Şêrewa, 26.7.2021 Z.
- Şewatek li daristaneke nêzîk G. "Keferdelê Jorin" - N.Cindirêsê, 27.7.2021 Z.